# Seyr e lê Rast e

*Bi tenê % 11



Bi tenê % 11 ( yazdeh ji sedê) ji ruberê erdî kêr çandinê dihêt û ev rubere jî sal bo salê kêmtir lê dihêt.

* Hey jara !

Nêzikî % 75 ji balindeyên kûvî , berê temenê wan bee şeş heftî, dimirin. Pişîk dijminê wan yê êkê ye û bi milyonan têjikên çûcka ji layê wan ve dihêne xwarin.
Hindî wan jî otumbêl li ser rêka dikujin û yên mayî jî yan ji birs û sir û serma da dimrin yan jî ji layê balinde û canewerên dî ve dihêne xwarin.



Berfa sor

Li sala (1755) ê berfeka sor li çîyayên Elp li Siwîsra barî. Egera wê jî ew bû ku ba û babelîska xîzê bîyabana bakûrê Efrîka di gel xwe rakir bû û ew xîz di gel berfê têkel bibû û rengê xwe da bû berfê.
Berfeka hosa li Kurdsitanê jî berî nêzikî sed salan barî bû.



* Ruwekin lê li ser axê şîn nabin

Di nav daristanên baranê da hindek corên gul û gîya hene li ser tayên daran şîn dibin, da ku têra wan hetav lê bidet. Ev gul û gîyaye avê êkser ji baranê vedixwen.